

**Tedbîrên nu** ji aliyê hukumetê ve doh roja **Sêşemiyê 28'ê Nîsanê** hatine ragihandin bi kurtasî li jêr hatine komkirin:

### **Bi giştî**

-SMS **hate rakirin** û **êdî çûyin** û **hatin serbest e**.

-Ji 18 Gulanê û **pêve destûr heye ku kesek ji parezgehêke biçî parezgehek din.**

-**Dêr/Kilîse wê ji bo îbadeta şexsî di 4 Gulanê da werin vekirin** û di 17 Gulanê da jî, ji bo hamû bawermendan werin vekirin, lê divê tedbîrên ewlahiyê werin bicîkirin.

-Plajên bi rêxistinî wê girtî bimînin.

-**Destûra bo armanca taybetî wê berdewam bike**, ev destûr wê li gorî vekirina dibistanan bimîne an wererakirin. Destûra taybetî a ji bo kesên girdeyî komên rîska mezin in, wê berdewam bike.

Bi hûrgilî:

### **1) Tedbîrên ji bo tenduristiya şexsî**

- Li hemû ciyên girtî wek Wesaîtên KomGuhêzê( bas-trên-metro), dukkan-magaza, nexweşxane, berber-kûafor, salonên xweşikbûnê, navendên bijîjkî û hwd **bi karanîna maskeyê mecbûriye**. Kesên ku van tedbîran bicîneynin 150 evro ceza li wan tê birîn.

### **2) Wesaîtên Kom Guhêzê(bas, trê, metro)**

-**Di Wesaîtên Kom Guhêzê(bas, trê, metro) da ji aliyê karker û rêwîyan da bikaranîna maskeyê parastinê mecbûriye**. Têketina rawestgeha wê bikontrol were kirin dakû pêwsitiya mesafeya fîzîkî bi cî were û seferên çûyin û hatina wesaîtan heta ji dest tê divê zêdetir bibin.

Zêdetir bi hurgilî:

- Armanca sereke ev e ku zeman-wexta li bendemayîna wesaîtên kom guhêzê (bas, trê, metro) kêmtir bibe.

-Di saet'ên ku çûyin û hatina gel pirr e, divê wesaît zêdetir bin, û **di demên navberê da jî wê wesaît kêmtir bin**, yanê saet ji 10 sibê heta saet 2 an û saet ji 6 bêrêvarê heta nîvê şevê.

- Ji bo teksîyan, qanûnên ku heta vê gavê derbasdibûn berdewamdikin, yanê ajoker-şofêr û yek rêwiyek, ji bilî îstîsnayên dê û bav û zarokên di bin 18 salî re an jî ji ber sebêbên tenduristiyê refekata yekî werekirin.

### 3) Dukkan-magaze

- **Di 4ê Gulanê da** dukkan-magazên perekende destbikardikin (pirtûkfiroş, dukkana berçevkan, dukkana cil û bergên werzîşê-spor, dukkana kullîlkan, ciyê bazaran û qedexeya li cotkaran radibe û êdî dikarin berhemên xwe ji parezgehekê bibin parezgeheke din li bazaran bifroşin) **û dayîna xizmetan** (berber-kuafor, salonên xweşikbûnê).

- Ji bilî navendên danûstandinê ê mezin dukkan-magazên din roja Duşemiyê 11 Gulanê wê werin vekirin.

- Navendên danûstandinê ê mezin di **1 Hezîranê da** wê werin vekirin, xwaringeh, kafetriya divê **li ciyê derve** û bi mesafeya 2 metra ji hev dûr û her mase 4 kes dikaribin rûnin.

- **Hêdî hêdî wê parkên ger û seyranê**, parkên zarokan li ciyên derve bi heman qanûnên mesafeyên durbûnê wê destpêbikin karbikin.

- **Û herî dawiyê, xwaringeh, kafetriya li ciyên derve û cîhên kêfxweşiyê, cî û warên betlanê û tesîsên werzîşê-sporê wê werin vekirin.**

Ji bo satên karkirina dukkan-karsaziyan wê serê sibê saet di 10:00 vebibin û li gorî rewşê wê werin dirêjkirin, **bikaranîna mesafeya ji hev dûrbûnê a 2 metran û bikaranîna maske ji bo kerker û mişteriyên divê pêk bê**, û dîsa tê pêşniyarkirin ku asansorê mişterî asansorê bikarneyinin. Eger bikaranîna asansorê mecbûrî be divê tenê ji 40% kesên ku tenê pêşdîtin bikarbînin. Eger dukkan-magaze derecek-nerdiwana diherikin hebe divê mişterî derecek-nerdiwanê bikarbînin, qedexeye ku mişterî asansorê bikarbînin

Ji bo berber- kuafora û salonên xweşikbûnê divê mesafeya **2 metran di navbera du ciyên kar da hebin**. Mişterî **tenê bi randevû** dikarin biçin berber.

Li salonên xweşikbûnê **bikaranîna maskê ji bo hemû kesan û destlepikên ji bo carekê ji bo karkeran mecbûrî ye**. Saet serê sibê ji 7.00 heta 22.00 her roj û roja Şemiyê saet ji serê sibê 7.00 heta 21.00 wê vekirîbin.

#### **4)Dibistan**

-Di **11 Gulanê da tenê pola 3an a Dibistana Amadeyî wê vebibe** û di 18 Gulanê da jî wê polên Amadeyî yên din û dibistana Navendî wê vebibin.

-Heke her tişt baş biçe wê di 1 Hezîranê da jî dibistana Seretayî û Pêşdibistana zarokan vebibin.

-Zarokxane-krêş wê girtî bimînin.

- *Navendên werzişên ê vekirî, wek sahên werzişê tîn vekirin û bi tedbîrên tenduristiyê werzişvan dikarin bikarbînin.* Navendên werzişên ên ciyên girtî neyên nayên vekirin. Û dîsa ciyên zarokan jî wê girtî bimîne, vekirina wan wê li gorî vekirina perwerdahiya dibistana Seretayî be.